



Siyabend û Xecê

Siyabendê Silîvî xortekî mêrxas û Xecê jî keçeke gelekî bedew e. Siyabend û Xecê herdû jî dengbêj bûn û ew evîndarên hev bûn. Lê bavê Xecê wê dide yekî din.

Roja daweta Xecê Siyabend, heft birayê wê dikuje û wê direvîne, dibe ser çiyayê Sîpanê Xelatê. Dema li ser çiyayê Sîpanê ne, Siyabend serê xwe dide ser çonga Xecê û radizê. Wê gavê keriyekî pezkovî di wir re derbas dibe. Xecê bala xwe didê pezkoviyek û heft gakovî ne. Ji wan congeyê kovî bi kloçan li yê dide û wan jî pezkoviyê dûr dixê. Her heft birayên Xecê wê tên bîra wê, dilê wê bi halê wê dişewite û ew digirî.

Çend dilop rondikên wê li ser rûyê Siyabend dikeve û ew jî xew şiyar dibe. Siyabend sedemê giriyê wê jê dipirse. Xecê jî hêstên xwe dibêje. Li ser vê Siyabend dixwaze wî cangeyî bikuje. Ew radihêje tîrik û kevanê xwe û dide pê pezkoviyên. Gava digihêje nezîka kerî, tîrik davê û cangê birîdar dike. Siyabend diçe ser cangekovî ku wî ser jê bike. Dema destê xwe diavêje kloçê wî, cange xwe dilebitîne destê Siyabend ji kloç difilite; lingê cangê li Siyabend dikeve û ew gêrî binê newala kûr dibe. Piştî wî li kelemekî dikeve û kelemê darê li ser dilê wî dide der.

Xecê dipê lê dema Siyabend venagere, ew jî bi şopa wî dikeve. Ji binê newalê nalînek tê guhên Xecê. Ew fêm dike ku ew Siyabend e. Xecê diçe serê newalê. Ew li serê newalê û Siyabend li binî, çend kilama davên berhev. Dawiyê Xecê jî xwe davê ser Siyabend û herdû jî dimirin. Dibêjin; her bihar li cîhê wan du terh gul radibin û du çûkê xweşik di ser re difirin. Dîsa tê gotin ku her çiyayekî Kurdistanê stêrkek wî heye. Ji wê rojê û pêyve yê çiyayê Sîpanê bûne dudu. Her du stêrk her şev li ser gora Siyabend û Xecê dibiriqîn û gora wan rohnî dikin.

Pirsên jêrîn bibersîvin.

1. Xecê ji bo çî digirî?
2. Siyabend ji ku derê ye?
3. Siyabend Xecê dibe ku derê?
4. Siyabend çima Xecê direvîne?
5. Çiyayê Sîpan Xelatê li ku derê ye?
6. Siyabend çawa dikeve binê newalê?
7. Biharê li ser gora Siyabend û Xecê çî dibe?

